

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûri; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERINENDE : MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Diwan û gerfîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Diwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41-Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

CENG & SIYASET

DEWRAN

HEVALBENDA PÊŞVE DIÇIN

Eniya Sovyetî

Ordîyên Sovyetî ber bi Mohilev, Gomel û Vitebskê ve pêş ve dikevin. Ava Dnieprê nikarî bû bervehatina leşkerên rûsî bisekinîne. Di dora payetextê Ukranyayê, şaristanê Kiyevê de, şerîne zor û sedar çêdibin.

Piraniya erdê Ukranyayê vegiriyayê xwediyên xwe. Yekîneyên sor di axa Rûsya Gewir de ne, û ber bi Mînskê ve dimeşin. Çavên elemana bi kaniyên Qefqasê yê gazê ne ketiye û erdê Ukranyayê a bi ber û hatin jî, ji destê wan derkel.

Elemanan dixwest bi zad û dexlên Ukranyayê xelkê xwe û yê Ewripayê bi xwedî bikin. Ordiya Sor bi pêşveçûna xwe a brûskî, nan û xwarina elemanan ji destê wan bir.

Şerê Erdê Italyayê

Ordiya britanî heşt û ya emerikanî pênç, ketine Napoliyê. Leşkerên Mareşal Keserlingî xwe ber bi aliya bakur û rohelatî ve bi gûnda dikişînin. Erdê ko ev çend roj in tede şer çêdibû asê ye. Elemanan pir û reyên ve erdê xirana berhewa jî kiri bûn. Lê gellî-tangên Hevalbendan û yekîneyên wan ên zirh û motorkirî, carna bi zehmet û carna bê zehmet di neval û geliyan re derbaz bûne û ketin deşta Napoliyê û pê dewra şerê Italyayê a diwemîn jî, bi serdestî û serûraziya qiwetên emerikanî û britanî qediyayê.

Welatperwerên Ewripayê

Di axa Frense, Belçîke, Norwecistan, Holende, Yewnanistan û Yugoslavyayê de, xelk, weterperwê û welatparêz, di pêşiya zorê-riya elemana de betal na minin.

Rêhesin û depoçebilxanên ber hewa dikin, karker û serbêndên elemana dikujn û li hin deran ne maza di Yugoslavyayê de, bi rêz û tertîb şerê wan dikin.

Civanekî Sêserî

Li gora nûçeyên dawîn wezîrên britanî, emerikanî û sovyetî yê dervekarîyê li Moskoyê civanekî deynin, û bi karê dinyayê ên eskerî û siyasî mijûl bibin.

Birmanya û Hevalbendan

Hevalbenda di sinorên Birmanayê de qiwetîne mezin kom kirine. Bema baranên Birmanayê ber bi xelaseka xwe ve diçe. Tête bawer kirin ko di vî eniyê de û wextekî nîzing de, Japon tîştine ecêbê dibînin. Di eniya Pesifîkê de paqij kirina erdê Nû—Gîneyê jî leşkerên Japona dom dîke,

BOMBEAVÊJÊN HEVALBENDA

DI SER ÇIYAYÊN ALPÊ RE

CEZAYIR— Bi awakî resmî didin zanîn: ev cara pêşîn e ko bombeavêjên qerargeha Efrîqa Bakurî ên giran, di ser çiyayên Alpê re firiyane, bi ser Germanîstana nîroyî de girtine û şaristanê elemanî Munich bombardîman kirine. Çûn û batî 2.500 kilomêtr. Jê pê ve bombeavêjên Liberators yê Ordiya Emerikanî a hewayî 8, di Wîner—Noystadê de li karxaneyên balafirî xistine.

LONDRE— Sê Ordîyên rûsî ên xurt, xwe ji bona êrîşa erdê Rûsya Gewir pêk diînin, Eleman jî gaziya xwe tînin.

Pîştî erdê Rûsya Gewir, erdê Polonyayê destpê dîke.

LONDRE— Mihacir bi piranî tînin erdê Svîçreyê. Di nav 20 rajên dawîn de 21.860 peya û 960 hêsrî, yê ko xwe ji axa talyana xelas kiri bûn, hatine Svîçreyê.

DI NAV DEH HEFTAN DE

Axa Donetz û Ukranyayê Hatine Vegirtin

Di nav deh heftan de Ordiya Sor Orel, Xarkov, Taganrok, Briansk, Poltava û Smolensk vegirtine.

Elemana ev şaristanê he hemî xurt asê kiri bûn. Di nav deh heftan de axa Donetz û Ukranyayê ji destê Hitler çûn.

Hitler goti bû: Ji bona mezinahiya Welêt ezê du sê milyon xort feda bikim, Wî hêj bêtir da kuştin, lê çî kar kir...

HONOLULU— Danezanê resmî elam dide ko qiwetên emerikanî girava Nanumeayê standiye; giravek jî yê Elisê: japona berberiya qiwetên emerikanî ne kirine.

NAPOLI KETIYE

DESTÊ ORDIA EMERIKANI PÊNÇ

CEZAYIR— Ordiya emerikanî pênç, şaristanê Napoliyê standiye.

CEZAYIR— Leşkerên hevalbenda San Anceolo vegirtiye, gehine keke rêhesinan li rohelatê Napoliyê.

CEZAYIR— Yekîneyên hevalbenda gihane taxeyên şaristanê Napoliyê yê dora bajêr. Ordiya emerikanî 5 Kastel-lamare standiye, ev avahîgeh jî Napoliyê 17 mlî dûr e; û taxeyên Napoliyê ên dûr li wê dest pê dîke.

CEZAYIR— Radyo Cezayirê dibêje ko: fermandarê eskerên dora Napoliyê, heye ko heta dema dawîn hervaniya Napoliyê bike.

CEZAYIR— Qerargeha Hevalbenda a mezin li Efrîqa Bakurî elam dide: Ordiya heştamin di pêşiya berberîyê sist de, ber ve tê. Ordiya pênçemîn, dijminê jî çeperên wan, yê çiyayên bakur û roavayê Salernê derexistîne û paş ve avêtine; dijmin di erdeke 1 dûr de xwe bi gûnda dikişîne.

LONDRE— Leşkerên britanî gihane palên çiyayê Vezuvê.

KRAZNAYA ZVESDA

QALA PERÎŞANIYA ELEMANA DIKE

MOSKÛ— Rojnama rûsî «Kraznaya Zvesda» dinivîse: elemana bi qesda sekinandina eskerên me di qeraxên Dnieprê de xebateke zor kirine lê ev tîst jî wan ne hat. Ordiya Sor êrîşên xwe bi serfirazî pêş ve ajotîne û pêş ve dajon. Yekîneyên elemanî yê ko dikirin vî aliya avê de pê bidin erdê, hatine avêtin Dnieprê, û eskerên ko ji mirînd xelas bûne hindik in. Çek û posatine heja, bi piranî ketine destê me. Eskerên elemanî piştî vî perîşaniyê, xwe ber bi Nînedne-provskê ve bi gûnda kişandine û dikirin li wê kom bibin û xwe pêk bînin, lê pêşmerên me têkîll wan bûne, rahetî ne dane wan û dawî yekîneyîne rûsî ên xurt bi ser wan de girtine û ew jî nû ve bela wela kirine. Bazdana-eskerên elemanî jî nû ve destpê kir û şerevaniyên elemana en mayî bi zehmet li avê derbaz bûne.

WEŞINGTON— Hawîrên agah didin zanîn ko civanê sêserî civanê nîmînenîyê Britanya-Mezin, Sovyetîstan û Emerikayê li Moskoyê wê çêbibe.

Di Pêşiyê de

Pêşiya me de, du pîrsên mezin hene. Di Sovyetîstanê de şerê Zivîstanê û êrîşa Hevalbenda a mezin li Ewripayê.—eniyê diwemîn! Hatîye gotin ko wextekî gelek nîzing de hero 1.000 bombeavêj û neçîrvanên hevalbenda bi awakî heta niha ne diî, dest bi bombardîmana axa elemana û hejagêhên di wê bikin.

Bi vî qesdê jî, Koma emerikanî a hewayî heşt hatîye saz kirinê **Dawiya Şerî**

Her kes jî xwe re di pîrse ev şerê he kengê wê biqede.

Mr. Çorçil di gotara xwe a dawîn de gava qala dema qedandina şerî dikir digot: ev şer dikare salekê, an du salên din dom bike.

HITLER

Çi Digot—Çiqewimî

LONDRE— Berî salekê Hitler digot: Di axa Donetz û Ukranyayê de me haziriya xwe kiriyê û kaniyên wan her du erdan, yê zad û zexîre û madenan, piştî me xurt bikin, zad û zexîreyên xelkê me û ma'denên ko karxane û febrîqeyên me hewcedar in, ji wan erdan wê ben. Ko em carekî ketin Stalingradê, êdî tu kes nikare me jê derîne. Mr. Çorçil bila Ordîyên xwe bişîne erdê Ewripayê, wextê xwe de ewe bibîne ko eskerên wî nikarin neh saetan di erdê Ewripayê de bimînin.

Gava Hitler ev tîst digotin Romel jî di tenîta wî de bû, û Romel jî vî civanî hat Efrîqayê û şerê El—Elemeynê destpê kir: elemana diviya bû erdê Mîsrê zeft bikin; û pê qidrata britanî, di welalên rohelatî navîn de xira bibe. Lê fro Stalingrad, Qahîre Skenderîye naye ser zimanê tu kesî.

Di Efrîqayê de girtîgehên hêsrînan teji eleman in, Ordîyên Hevalbendan Napolî standiye. Stola talyanî xidmeta Hevalbendan dike

Ordiya Sor dora Kievê girtiye, ber bi Mînsk û sinorên polonyayê ve dimeşe.

DANEZAN

KORS TÊTE PAQIJ KIRIN

CEZAYIR — Serfermandariya frensîz li Ffrîqa Bakurî, duhî êvarê danezana jêrîn helav kiriyê:

Leşkerên me li her derê dijmin bi gûnda zivîrandine, û wan jî Asêgehên ko ji bona midafîa Basîlyayê hewce ne derexistîne. Qiwetên me Geliyên San Leonardo û San Stefano vegirtine û her bi geliyê Temyînayê ve pêş ve ketine. Di nav du rojan de, neçîrvanên frensîz 17 balafirên elemanî avêtine erdê; 12 mekîneyên me venegeriyane warên xwe.

DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRE

De lê, de lê, de lê
Mi di bû li serê latê
Esker çû taqîbatê
Tu l'êr çavê mi'r hate
Ezê b' çepilê te bigirim
Xwe havên qeza Qirqatê.

De bimeş gewra m bimeş
Ez xulamê çavê belekreş
Wan birhûyê te yê bi neqş
Rojê ko mêrê te bimirê
Serê min û te,
L' dinyê bimînin xweş.

Go : Işev şeva sîsiya ye
Û dawetek digeriya ye
Dilê mi ket diduyaye
Ezê gewrê birevînim
Ma xwe ne dinya bi dergeye.

Işev êvara îne
Melê dixwîne vasîne
Memik sêvê Mêrdîne
Xwezla mi b'dilê wî xortî
Ko cotê memka bibîni.
Işev êvara sebtê
Memik sêvê Mêhsertê
De bimeş, gewra m bimeş
Xulamê çavê belekreş
Rojê mêrê te bimirê
Serê min û te l' dinyê
Bimîne xweş.

DEMA NIHA

Di Hemî Eniyân De Erişên Hevalbendan Dom Dikin

Leşkerên frensîzî girava Korsê bi timamî vegirtine. Di Sovyetîstana de pêşveçûna Ordîya Sor dom dike. Di eniya talyanî de Ordîyên 8 û 5 ber bi Romayê ve dimeşin. Refên Hevalbendan bajarên elemanî û nemaz e Frenkfurt bi awakî zor bombardîman kirine. Li pesîfîkê leşkerên Hevalbendan bi ser girava Bugenvîlê de girtine.

TEMO & ÇELENG

Temo kurê gundiyeşkî jî gundên zozanan bû, pê dikir sala hijdehan, xortekî çeleng, bi beja, çav û brû û por reş. Xortekê, di tîpên rûye wî da mîrxasiyê xweya dikirin.

Çelengê jî bi salên xwe jî Temo sê salan biçûktir bû. Ev jî, keçeke spehî, nav zirav, sing bilind, por zer û çav heşîn bû. Ew jî bajêr bû, qîza Rustem xanê ku xwediye gundê Temo bû.

Rustemxan, her sal havînê li gundê xwe diqedand. Temo û Çeleng, demên zarotîya xwe ên geş bi hev ra borandin. Dema Çeleng sê salî bû, û hê nû bi ser lîngan diket, di nav zarokên gundê de bê Temoyê geş salî, hej ne dikir ko bi kesî din ra bileyize. Ji ber ko Temo kurîkekî pir xwîn sivîk û zimân şîrîn bû. Tev diçûn digerin, di nav rezan û bexçan de, dirêjahiya rojan li ser cokan û kaniyan, li nav kulîlk û çiçekan, dibin darên meywan da diqedandin, û bi hev ra didan pey kurmê buharê, û qulên çûkan, rojê peyde jî nav dehlan der ne diketin.

Temo û Çeleng ketin nav salan û gir bûn, her mezintir dibûn, hej kirina wan jî ji hev re gîstir dibû û dilê wan xurtir bi hevê dihatin girêdan, roj bi roj, hevaltiya wan a zarokî dihatê guhartin bi dostaniya evînî, lê her du jî, ji hev û du fehêt dikirin ko li pêş hev, wî tiştê di dilê xwe da bidin ber rûyê hev. Çend û çend Temo

jî xwe ra digot: «Vê carê ezê jî mehbûba xwe ra komeka ha bibêjim: lê Çeleng, heyê ko em jî hev û du re bin?» Gava bi diyarî hev diketin, Temo dil dikir a di hundirê xwe da bibêje; lê canê wî dile-rizî, rûyê wî sor dibû, û berê xwe jî wê badida, Çelengê jî ew halê ha seh kiri bû, heyanî rojekê ce-gêr hate wê û gote wî: Temo! ey hogirê min! te xêrê! gotina xwe bibêje... blê-naya di hundurê xwe de rake...! Temo berê xwe da wê, li çavên di rengê ezmanan da nêrî û got: «Çeleng... belê hey Çeleng... heyê ko em jî hev re bin, û heya mirinî bi hev re bimînin?» Çelengê lê vegerand: belê ez benî, erê yaro gerek ûsa be.

Temo dest avête gulekî û çinî, û gote Çeleng: eve, eve qelenê te ê pêşîn. Çelenga min, xweha zarotîya min, hevala ciwaniya min, ortaxa jiyîna min, û gul xiste destê wê ên nerm û givagî.

Çelengê rojên dibistana xwe timam kir, her kes jî xelkê bajêr dihat û destê wê jî bavê wî dixwest, û hemû jî serek û mezinên kurdan bûn. Her xwezgîniyek nû dihat, bavê Çelengê derbas dibû cem wê, gewra wê dibir û jê pira dikir: Keça min î delal, şlan kes tu jî kurê xwe re dixwaze, tu çawan dibînî? Her dem qîzê-bi fedî-î lê vedigerand û digotê: «nê bavo, no navê min mîr bibim;»

(ne qediyaye)
SUBHIYÊ DIYARBEKRI

Strana Kurdî

BAZO

Bazo, Bazo
Lî me hatî, danê êvara;
Sihê diyara
Xwe berda kokê zînara,
Xwezî hakîmkî adil
Di welatê me rabûna
Bila bi çepî jîna qenc bigirta
Bila berda jî kotî pîsa
Jî mirdala...
Bila bida çeleng siwara
Stranvana...
Bazo, bazê min ol
Rubnîka her du çavê min ol
Jî war ocaxê mala bavê mino
Bazê xelkê te bejin zirav ol
Jî terha benkê.

AXAO!... AXAO!...

Axa ol... Axa ol...
Biçûk o, xêşim o, nûgiha ol
Rêşê mehkûma û çetaol
Eşîra giran jê bi gûnda ma ol
Kaniya Hewrizê bişewite
Jî kula dilê min re
Wa bi dar û dirî
Mi dî Şemsê bi sê dengadikîr gazî
Ban dikir Qenco, bira o...
Firçe qomandarê dewletê
Lî wî gawirê Şeqekîrî
Mi dî Qenco bi sê denga kîre gazî
Ban dikir Şemsê porkurê, nemayê
Rab' herê xwe bidê Mirdînê xopan
Cem mala Şex Tahir
Şexê Ensariya, here gîlî
Tu a bibêjt Şex Tahir

Kuştin Eliyê Ehmed
Beranê poşek, gamêşê tirka
Beranê soring-kirî
Ez ne ketime ber heyra malê dinyayê
Ez ne ketime ber heyra kuştina mîra
Heyfa min tê li wê heyfê
Çawan çira mala bavê min
Jî êvara Xwedê de vedimîrî...
Axa ol... Axa o, biçûk o, nû giha o
Kevirê şifê dêrê ermeliya o...

HELMCANÊ

De can bi can be, Helmcane
Ê lê Helmcane
Heyran, ez ne tî me
Û ez ne bir çî me
Ez li ber sihka Bedîsa hopan
rûniştîme
Ê lê Helmcane
Heke tu avkişênî, ez gelekî tî me
Heke tu nanpêjî, ez birçî me
Heke tu sing firoşî, ez mişterî me
Heger tu na firoşî
Roj hezûra heq
Ezê li ser pela selatê
Destê min û dawa te
Ezê li Helmcana xwe de weçî me
De can bi can be, Helmcane
Bav kopekî mîr xulamî
Ê lê Helmcane ez bi heyran
Bedîs bi şewite wa li wê ye
Heyfa min nayê li ser malê dinyayê
Evê teresê polîsê destê min girêdanê
Berê min dan mîrata eskeriyê,
Ez ne ketime ber wê heyre
Çawa mi dî cewaba nexerê
Jî mîrê tî ye
De can bi can be, Ê lê Helmcane
Bav kopekî, mîr xulamî.

PEJINÊN DINYAYÊ

CENG & BIHINGEH



General Şadebek de la Valad, Serfermandarê Qiwetên Frensîzî Li Erdên Rohelatê Navîn û Serekimhûrê Libnanê Mîrza Bişara El Xûrî



Gernasiya Cengkeştiya Frensîzî Akonit, Ya Ko Di Nav Sê Çar Deqî-qan De, Du Noqavên Elemanî Xeriqandine; Noqavên Ko Destriyora Britanî Harvester Da Bûn Ber Torplîan. General De Gol Bi Dana Ni-ganan Qedrê Qomandar û Deryavanên Wê Waporşerê Frensîzî Griye.



Şerovaniyekî Frensîzî; Lebatek Ji Qomandosên Frensîzî Yê Ko Bi Ser Girava Korsê De Girtine û Niho Erdê Ve Giravê Ji Elemana Paqijî dikin.

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wkfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Sigs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

La grande retraite allemande continue sur tous les fronts. Certes, cette retraite que la propagande allemande s'attache à présenter comme voulue et préparée est en effet nécessaire. L'effondrement de l'Italie, la nécessité de consacrer au front occidental un nombre imprévu de divisions impose à l'état-major allemand de céder du terrain devant l'irrésistible poussée russe pour éviter un nouveau Stalingrad.

Les armées russes investissent méthodiquement la ligne du Dniepr la bataille pour les passages du fleuve a même déjà commencée L'Armée rouge a remporté un important succès en prenant d'assaut Kremenouch. L'assaut de Kiev se prépare. Plusieurs îles fortifiées situées en face de la ville ont été conquises par les troupes russes.

Toutefois, l'effort essentiel de l'Armée Rouge semble être dirigé au centre, contre les bases de Vitebsk, Moghilev et Gomel. 50 divisions russes avancent dans ces trois secteurs contre les lignes de défense allemandes qui protègent Minsk, capital de la Russie Blanche. Déjà les villes de Roudina en direction de Vitebsk et de Krichev en direction de Moghilev ont été prises; quant à Gomel, menacée de trois côtés, sa chute paraît inévitable.

Une percée russe dans ce secteur aurait des conséquences désastreuses pour l'ensemble du front et l'Etat-Major allemand est décidé à l'empêcher à tout prix. Il s'agit pour les Allemands d'éviter des événements irréparables avant les pluies d'automne qui ralentiraient nécessairement les opérations.

o o o

En Italie, la nature même du champ de bataille étroit et montagneux offre de bonnes possibilités de défense. Mais ces avantages sont en grande partie compensés par la supériorité aérienne des Alliés. La prise de Foggia, centre aérien le plus important d'Italie doit être considéré comme un des succès les plus importants des derniers jours. La possession des bases aériennes entourant cette ville permettra, sans doute aux Alliés d'accélérer le rythme de leur offensive, et, après la prise de Naples qui a permis aux anglo américains de déboucher sur la plaine du littoral, d'utiliser toutes les ressources de leur armement motorisé.

INTERIM

Provisoirement, LE JOUR NOUVEAU paraît chaque Lundi.

LA LITTÉRATURE COMME BASE DE LA VIE NATIONALE

UN ESSAI SUR LA LITTÉRATURE TCHÉCOSLOVAQUE

Par V. ALES

La survivance, à travers les siècles de luttes, de souffrances, et d'oppression, de la littérature tchécoslovaque est l'un des plus remarquables phénomènes de la culture européenne.

La production littéraire tchèque — car jusqu'à la première moitié du XIXe siècle il n'y avait pas une littérature slovaque séparée, les auteurs également slovaques écrivant en tchèque — la production littéraire tchèque commença à XIe siècle. Jusqu'au XVe siècle, c'étaient les ouvrages religieux et moralistes qui prévalaient dans la littérature tchèque. Le célèbre réformateur Jan Hus / lire: Yan Hous; 1369—1415 /, patriote ardent et fondateur de l'orthographe tchèque moderne, est le plus éminent représentant de cette période.

Le XVIIe siècle, l'âge d'or de la littérature tchèque, est caractérisé par des œuvres en prose, ouvrages historiques et relations de voyage, mais aussi par une traduction splendide de la bible la bible de Kraliky /, un trésor de la pure langue tchèque au cours des siècles tragiques à suivre.

En 1621, les tchèques ont perdu leurs indépendance et furent exposés à une terreur sanglante infligée par la dynastie germano-autrichienne des Habsbourg. Cette oppression était très semblable à l'asservissement nazi de nos jours. Or, c'était juste au cours de cette période que la nation tchécoslovaque a produit l'un de ses écrivains les plus grands et les mieux connus dans le monde entier: c'était Jan Amos Komensky / lire: Yan Amoss Komensky; 1592 — 1670 / mieux connu à l'étranger sous les noms de Comène ou de Comenius. Passant la plupart de sa vie en exil, il est devenu un philosophe éminent et le fondateur de la pédagogie moderne / il est souvent appelé «l'instituteur des nations» /.

La terreur habsbourgeoise a causé une décadence de la littérature et même de la langue tchèque. Une renaissance n'a commencé que plus d'une centaine d'années plus tard, vers la fin du XVIIIe siècle, quand le régime politique devenait plus libéral, sous l'influence, des idées nouvelles françaises et anglaises. Alors, les tchécoslovaques recommencèrent à cultiver leur langue et leur production littéraire. Cette renaissance culturelle était le début de la renaissance politique également: le développement politique d'aucune nation n'est tellement influencé par sa littérature, par sa vie spirituelle, que le développement de la nation tchécoslovaque. Tandis qu'ailleurs la culture est souvent le produit du bonheur politique, chez les Tchécoslovaques les deux vont toujours ensemble et, souvent, toute la vie politique, toutes les aspirations nationales sont directement basées sur la vie spirituelle, sur les tendances morales et culturelles propagées par la littérature. Le début de cette renaissance nationale tchécoslovaque est marqué par les noms de plusieurs savants: du philologue Josef / lire: Yosef; Dobrovsky / 1733 — 1829 /, du philologue et historien littéraire Josef Jangmann / lire: Yosef Youngmann; 1773 — 1847 / et de l'historien P.J. Safarik / lire: Chafarjik; 1795 — 1861 /. L'historien Frantisek Palacky / lire: Frantichék Palatsky; 1798 — 1876 / était non seulement un savant de rang, mais aussi le fondateur de la politique tchèque moderne; son peuple reconnaissant l'appelle «le père de la patrie». Le poète le plus distingué était Jan / lire: Yan; Kollar / 1783 — 1852 /, un poète écrivain en tchèque, maître d'une poésie panslave romantique et visionnaire. La poésie du peuple a inspiré Frantisek / Ladislav Celakovsky / lire: Frantichék Ladislav Tehelakovsky; 1799 — 1852 / et Karel Jaromir Erben / lire: Karel Yaro- mjr Erben; 1811 — 1870 / les ballades d'Er-

ben / lire: Erben donnent même à présent une impression complètement moderne et peuvent être considérées comme le chef-d'œuvre classique de ce genre dans la littérature tchèque. Cette première période de la poésie tchèque moderne culmine avec le byroniste Karel Hynek Macha / lire: Makha; 1810 — 1836 /, le fondateur de la poésie lyrique, et avec Karel Havlicek-Borovsky / lire: Haulitchék-Borovsky; 1821 — 1856 /, le fondateur de la poésie satirique et en même temps, le premier grand journaliste tchèque, mort comme victime de la persécution habsbourgeoise.

Vers le milieu du XIXe siècle, la littérature tchèque avait dépassé sa période rudimentaire. A partir de ce temps-là; nous ne suivrons que la belle littérature, sans pouvoir, dans un court essai, mentionner le développement rapide de la littérature scientifique de toutes les branches. Mais, quand même, il faut citer au moins un nom le plus noble de tous: celui du Thomas Garrigue Masaryk / lire: Tomach Garrigue Massaryk; 1850 — 1937 /, philosophe profond, l'un des plus grands théoriciens de la démocratie dans le monde entier, chef moral et politique de sa nation et qui exerçait dans le XIXe ainsi que dans XXe siècles, une immense influence sur sa vie spirituelle et publique et était enfin le premier président, le Président-Libérateur, de l'Etat tchécoslovaque renouvelé, de la République Tchécoslovaque.

La belle littérature tchèque, la prose ainsi que la poésie, restait toujours inégalement liée avec la vie du peuple / avec son patriotisme, avec son sentiment social et avec son démocratisme profond. Presque tous les grands hommes de la nation, et les écrivains surtout, provenaient des classes des gens simples, des paysans, des petits bourgeois, etc., et le caractère de la littérature prouvait qu'ils n'oublièrent jamais leur origine. Le roman «La bonne-maman» / lire: Májena Nyemtsova; 1820 — 1862 /, était le premier chef-d'œuvre moderne à être traduit en plusieurs langues étrangères et à gagner une renommée mondiale; c'est une description réaliste et idyllique en même temps, de la vie des paysans. Le plus profond écrivain de cette période était Jan Neruda / lire: Yan Nerouda; 1834 — 1891 /, en poésie le Heine, en prose le Dickens tchèque. La poésie sociale a trouvé son premier grand représentant dans la personne de Svatopluk Cech / lire: Svatoptouk Tchekh 1846 — 1908 /, avec ses pathétiques «Chants d'un Esclave». Or, la période culmine par le poète Jaroslav Vrchlichky / lire: Yaroslav Vrkhitsky; 1853 — 1912 / qui, à part d'une production originale incroyablement riche, était le traducteur magistral de Dante, d'Ariosto, de Tasso, de Shelley, de Victor Hugo, de Camoens, de Goethe, de Whitman, de Calderon, de Mikiewicz etc etc., contribuant beaucoup au développement de la langue poétique tchèque moderne.

Vers la fin-de-siècle et au début du XXe siècle; le roman tchèque continue à décrire la vie de paysans, d'ouvriers, de petits bourgeois, Ce roman réaliste, influencé beaucoup par les écrivains français et russes, a trouvé son meilleur représentant dans la personne de Karel Malej Capek / lire: Karel Malgýy Tchpek-Khod; 1860 — 1927 /, mais aussi le roman historique fut beaucoup cultivé, et son premier représentant, Alois Jirasek / lire: Alois Yirasek; 1851 — 1930 / a par son œuvre littéraire largement contribué à la force morale de la lutte du peuple tchécoslovaque pour la délivrance du joug étranger. Signalons encore le roman lyrique, et la fine poésie, de l'auteur subtil Frana Sramek / lire: Franya Chramák; né 1877 /. (A suivre)

POÈME MODERNE TCHÉCOSLOVAQUE

Le chant des Emigrants

Par JAN SMRAK

Combien sont ils qui partent
Pour sillonner le ondest
Leurs chansons d'émigrés
Résonnent à la ronde.
Les uns peinent déjà
Dans les pampas sauvages,
D'autres ont des chevaux
Et d'autres des plantages.
On se plie avec peine
Au parler étranger,
Tandis qu'à la lueur d'une veilleuse
La langue maternelle
Est comme un ostensor
Et chante pour eux
Saintement le soir,
Sa musique joyeuse,
Sur un navire, scie immense,
Qui tranchait sans vibrer
L'Himalaya des flots,
Des jours, des nuits,
Et naviguait jadis.
Ce que l'homme détient
De divine puissance
Dans sa terrible main.
Alors je l'ai compris,
J'étais debout sur le vaisseau,
Lorsque le vent m'a cinglé,
M'imprimant son terrible sceau
Pour que je m'en souviene encore
Dans mes montagnes,
Chauffeur qui bourre
Le four de charbon,
Ton épaule est de plomb,
Tes bras de fer,
Quand ils s'efforcent.
Si j'étais jeune comme toi,
J'unirais ma force à ta force
Pour faire tourner les hélices,
Trop délicat pour que je puisse
M'unir au rythme des machines,
Indolemment je m'achemine
Vers le groupe des émigrants
Qui jettent par dessus les ondes,
Semblables aux blanches colombes
Leurs tristes chants,
Voilà ceux qui vont en avant.
J'offre à l'écume mes paupières,
Jetant la fleur marine au vent,
Suprême adieu
Du pays de mes pères.
Tordant sa queue
Etrange de baleine,
Le bateau vogue vers le port,
Les mères se signent alors,
Les épouses baissent la tête.
Lorsque les dernières fumées
S'élèvent au-dessus des flots.
On dit adieu aux matelots,
Et ce choral tout nostalgique
Se confond avec l'ouragan
Qui tourmente le Pacifique.

Jan Smrak / lire: Yan Smrèk; né 1899; peut être considéré comme le plus important des poètes modernes slovaque. Ses vers sont marqués par beaucoup d'inquétude — son premier livre, publié en 1922, porte le titre caractéristique: «Condamné à la soif éternelle». C'est un poète d'un talent lyrique spontané et d'un sens admirable du rythme.

ALGER (A.F.I.) — Le Haut-Commandement Français a publié hier soir le communiqué suivant:

«Après la libération totale de la Corse, nos troupes procèdent au nettoyage des mines et autres engins destructeurs posés par l'ennemi. Les Allemands ont abandonné un matériel de guerre considérable, des vivres, des tanks et des munitions.

Nous avons fait plusieurs centaines de prisonniers.

BERLIN — La radio allemande signale que les Alliés utilisent maintenant un nouveau type d'avion pour les attaques à basse altitude.

MIREKA CIHANE

MIRÈKA CIHANÈ MIRÈKA WENËYÈN SER Û AŞTIYÈ

EVE EMERIKE

Ev çend car'in, me di wan rapelan de li ser Emerkayê nivîsiye û bi çend pirsan qala rêzik û tevger û qidret û mezinahiya wî welatî kiriyê.

nahiyê. Hemi miletên cihanê wilo kirine, divê em ji wisa bikin. Şandina zaroyan medrese û dibistanan tişteki zehmet e, qiwet jê re divêtin.



Ji bona xurtî û mezinahiya miletan reyek heye, ev ji riya xwendin û zanîne ye, hemî miletên dinyayê ên zexim tere derbaz bûne û githane miradê xwe.

Miletêk bê ko zaroyên xwe bişîne medrese û dibistanan, bê ko xortên wî miletî bibin zana û şerêza, bibin seyda, diktora, mihendiz ewikal, zabit, nikare bigehe mezi-

Lê herweki bê fidakarî tu tişt naçe serî, de û bav, heke hewce bû divê ji nanê xwe kêmbikin û zaroyên xwe bişînin medrese.

Miletên dinyayê hemî ev tişt kirine, Emerîka bi destê de û bavên wilo de, bûye ev Emerîka.

Stûnên xurtiya mileteki didone: yek zanîna din mîranî.

Xwedê ji kerem û comerdiya

xwe mîranî da me, divê em ji bi namûs û xeyrêta xwe zanîne bixin destê xwe, wê zêft bikin.

Wê gavê di nav miletan de em ji dibin miletkî, û di nav peyazan de peyayekî; em ji dibin peyayên serbest.

Piştî şerê mezin ê berî yê sala 1914-1918 an, Emerîka, Frense û Brîtanya-Mezin dixwestin hemî miletên dinyayê bigihînin serbestiyê.

Heqê miletê me ji hafî bû nas kirin; lê em ne ev mirov bûn ko serbestiyê bi destê xwe xin. Çire? Ji ber ko em nezan bûn, me heqê xwe nas ne dikir.

Iro Emerîka ji nû ve ji bona azahî û serbestiya miletên Cihanê, —biçûk û mezin tev de— ketiye şer. Heft milyon xortên Emerîkanî bûne esker.

Karxane û Febrike, û destgehên emerîkanî, bi şev û ro dixebitîn, çek û posat, sileh û cebilxa

ne, tang û balafir, cengkeştî û gemiyên barkêş çedikin. Çar milyon ingilîz ji ketine eskeriyê, li hewa û di reşayî û behrê de, bi egîdî şerê dijîmîna dikin.

Bist milyon eskerên Urîs, eleman dane pêşiya xwe dişînkînin. Xwîna însana mîna av diherike, agir û gulle û bomban qiyamet radikin.

Xortên dinyayê ên heja û xwenda ji bona azahî û serbestiya miletên xwe dixebitîn, şer dikin û canê xwe didin kuştinê, û di wê xeyret û xebatê de jin û mîr destbiratiya hev û du dikin!

Geîl Kurdan... Zaroyên xwe bişînin medrese û dibistanan, û heke hon bi xwe mezin bûne a edî nikarin herin dibistana, ji qene ve hîfî Xwendin û nivîsandina zmanê xwe bibin. Zmanên miletên mezin bihelimin hîfî ilm û hineran bibin.

Ev e riya xelas, serbestî û mezinahiya me.

Eliyê Biraîm bavê xezebê gelek hene. Ji nîro bi şûnda li milê tapuyê hucûm kir ser kozikan û gelek tabûya bi kerstîxê xencera tev alî yan.

Emînê bankir: Hezarê dêranê, xezebê porkurê, xwezî berê rokê pêşda ez bi çûma bajarê qoce Erziroma şewitî, ser dikanê taciran û va miqsiya: min ê bazar kira ji qîz û Bûkê mala Nasir ra şeran û temezîya minê ji her çar beranê mala Nasir ra bazar kira qeytanê Kurka zencîrê saeta û Kostekê şaş agira. Cebil-Xanak du du derbê canfidîya şahidê Mehemed Eliyê Biraîm bavê xezebê gelek hene, nala zêrkî ji zêrê mehmodî tu bawî nav koma van mecîdiya, nala berankî ji beranê.

Rizayê Xalid tu todekî soringî ke qenarkî bibire çelê mubareka havînê li Bingola şewitî li şerêf dîne berde nav mîhê lebencîya.

Ez im, sed carî bi min ez im Bi şarê Çeto bankir Heçî Mehemedê Mistê Reşkotî go-mere Xulama Xwedî nake, di ser evdulezîzê ba file re ew cwanmêra ji berêda siwarê kuhelyanê nêr e.

Mêzeke iro sê rû sê şevê wî

qediyane, file lawê file li şûna Kozîkê mala Nasir rûniştîye, gulle li şûna gulle na guhêze. Emînê bankir: Hezarê dêranê xezebê porkurê Zercel bi şewite bi darê te re şahid û suhûdê bavê xezebê gelek hene. Bankir Rizganê axa Keko bi qesem be ez iro ji ber Bişarê Çeto û Heçî Mehemedê mistê Reşkotî Isayê Mirze nefrî ama welatê jorîn tev nagerim.

Emînê bankir: Hezarê rebenê bira Kula Xwedê tê keve mala heçî Mihemedê Mistê Reşkotî Ne-frî ama li mezin kuştine Xalidê bira û Rizganê axa bi duvazde gula birîndar e û qapaxa qafê Hemidê zava li erdê ye, dev na gere ez çibikim kozika Mehemed Eliyê Biraîm lê teng bûye, enexatî di destê Mehemed Eliyê Biraîm da dile tûtik tê da asê bûye pê nabe şerê.

SPAS

ARIKAREN ROJA--NÛ

Bi destê Seydayê delal Ebdilhadî Mihemed peryên jêrîn ji me re hatine şiyandin, em ji dil spasan dikin.

Mirza' Hac Hemo 50 lîreyên sûrî M.M. Mehmod Hiseyn, Sileyman Hac Hersan, Mecîd Hemî, Mihemed Ezîz, Hiseyn Biraîm Çolî, Şêx Mûs Yunis, Hesên Erslan, Hesên Mihe, med Xello, Mela Salih, Ferêc axa Hac Yusif, her yek ji wan 10 L. S. û Mirza Hac Biraîm 5 L.S. dane.

SERÊ MALA NASIR

2 — EBDILHADÎ MIHEMED —

Heçî Mehemedê Mistê Reşkotî mêze ke, pênc siwar ji jêlî tîn û dilezînin, yek Xalid e, yek Heçîmd e û yek Husnî ye û yek Rizgan e.

Mi tu carî derbê giran ji destê wan ne dîne, hema bi tîrs e ji siwarê şîn bozê siwarê pêşîn e.

Ez Nişanê wî ji te ra hildim, wa ya Mehemed Eliyê Biraîm e bavê xezebê kinê gurover e.

Rojê yoşulmê giran bi ser kozîkê lawê bava de, dicadîne, kozê kurê bava daim bi ser da hildîşîne.

Rojê yoşulmê giran daim sûstemê mîryê ji destê kurê bava derdixîne; iro mîr be nava xwe bi şidîne, pa bi qedrê Xwedê bî, em iro of û xweşya xwe ji destê bavê xezebê nabînin.

Emînê bankir: Hezarê rebenê xezebê porkurê iro şer çiya li mala bavê min û te şer bi dîr kir şahidê Mehemed Eliyê Biraîm bavê xezebê gelek hene bi welfî nê lawê bava re bi Holbûnê çoft


û egala re bi urîne, gamêşê girare rahişt nava xerzaniyê hucûmî ser koza Heçî Mehemedê Mistê Reşkotî kire.

Kulo Xwedê bi kul bê tê keve mala Heçî Mehemedê Mistê Reşkotî û ev dulezîzê ba file û Eliyê lawê Cibo gulakê lîxistîne li bejna Mehemed Eliyê Biraîm li Hêla rastê perçê cegerê bi qolonve sor kirine.

Emînê bankir: Nûrê karê çira mala Nasir tefandine, û axê mala Nasir ji binîda Kul û Kar kirine.

Emînê bankir: Hezarê Rebenê çî bû çî çiriya: roj di nîro da şikîya ber û barûdê segmanê mala Nasir lê qediya, îşev ez raketim mî xewneke nexerê dîbû, mi dî govendek bi du def û bi du zorna li hêşîya mala bavê min û te di gerîya.

Mi dî serê çar Boxê û Berana di qazana mala bavê min û te da, di qazanê holiyê hol û fire da bi xwe dikeliya; şahidê Mehemed



Ştola Emerîkanî Di Belhra Pesîfkê De